

Multi-CAST

*Northern Kurdish
translated texts*

Geoffrey Haig
University of Bamberg

May 2019
v1.1

Hanna Thiele
University of Bamberg / University of Freiburg



ARC CENTRE OF EXCELLENCE FOR
THE DYNAMICS OF LANGUAGE



Australian Government
Australian Research Council



University of Bamberg

DFG

Multi-CAST

Multilingual Corpus of
Annotated Spoken Texts

Citation for this document

Haig, Geoffrey & Thiele, Hanna. 2019. Multi-CAST Northern Kurdish translated texts. In Haig, Geoffrey & Schnell, Stefan (eds.), *Multi-CAST: Multilingual corpus of annotated spoken texts*. (multicast.aspra.uni-bamberg.de/) (date accessed)

Citation for the Multi-CAST collection

Haig, Geoffrey & Schnell, Stefan (eds.). 2015. *Multi-CAST: Multilingual corpus of annotated spoken texts*. (multicast.aspra.uni-bamberg.de/) (date accessed)

The Multi-CAST collection has been archived at the *University of Bamberg*, Germany, and is freely accessible online at multicast.aspra.uni-bamberg.de/.

The entirety of Multi-CAST, including this document, is published under the *Creative Commons Attribution 4.0 International Licence* (CC BY 4.0), unless noted otherwise. The licensing terms can be reviewed online at creativecommons.org/licenses/by/4.0/.

Multi-CAST Northern Kurdish translated texts v1.1 last updated 8 May 2019
This document was typeset by NNS with X_YL^AT_EX and the *multicast3* class (v3.0.9045).

Contents

1	<i>muserz01</i>	1
1.1	Utterances 0001–0050	1
1.2	Utterances 0051–0100	3
1.3	Utterances 0101–0150	5
1.4	Utterances 0151–0200	8
1.5	Utterances 0201–0207	10
2	<i>muserz02</i>	12
2.1	Utterances 0001–0050	12
2.2	Utterances 0051–0100	14
2.3	Utterances 0101–0148	17

1 muserz01

1.1 Utterances 0001–0050

- 0001 *Harûnê Reşît paşayê Ereba bûye.* Harûnê Reşît was the Pasha of the Arabs.
- 0002 *Merifekî di dinyayê da pir zengîn bûye.* A man of the world, very wealthy.
- 0003 *Kurekî wî hebûye, navê kurê wî Mihemed bûye.* He had a son, whose name was Mihemed.
- 0004 *Mihemed, emrê wî tê pencî salî.* As for Mihemed, he was 50 years old.
- 0005 *Qedera vî venebûye, ne zewicîye.* His destiny had not been fulfilled, he was not married.
- 0006 *Êdî çaresîz dimîne.* And now he sees no solution (for this state of affairs).
- 0007 *Radibe tere cem ewê ku ilmê minecîmî dixwînin, ji wan ra dibe minecîm.* He went to those who draw on the knowledge of astrology, they are called minecîm (from the Arabic word for astrologer, also used in Turkish).
- 0008 *Ewana fal davêjin, remil davêjin, fala vedikin,* They tell fortunes (by throwing special dice), they reveal (one's) fate,
- 0009 *ji qedera însana, ji rizqê însana dikarin xeber bidin.* they can tell of people's destiny, of their rewards.
- 0010 *Dibê: "Ezê herim cem wan remildaran, cem wan sihîrçîyan* (He) says: "I will go to those fortune-tellers, those sorcerers,
- 0011 *birra ji min ra mêze bikin, ka çima qedera min venabe, ez çima nazewicim, sebebê wî çiyê."* that they may look for me and discover why my destiny is not fulfilled, why I am not married, what is the reason."
- 0012 *Tere ji wan ra dibê.* (He) goes and speaks to them.
- 0013 *Ewana dibên: "Em fala bi stêrka vedikin, birra bibe êvar,* They say: "We will reveal (your) fortune through (reading) the stars, let night fall,
- 0014 *stêrk jî derkevin, em li stêrka mêzebikin, em ê ji te ra falekî vekin, ji te ra bêjin."* that the stars come out, we will look at the stars and read your fortune, and (then) tell you."
- 0015 *Dibê êvar, eva stêrk derdikevin, ewana li stêrka mêze dikin, fala xwe datînin* Evening falls and the stars come out, those (fortune tellers) gaze at the stars, make (lit. 'place') their predictions,
- 0016 *dibên: "Mihemed di nava vî heftayê, em têda, di nava vî heft rojê han da, di malê cînarê te da ew ê jinekî biwelîde,* saying: "Mihemed, within the space of this week, we are in it, in your neighbour's house, that of a woman, she will give birth,
- 0017 *dergûşekî qîzin jê ra bibe, ew dergûşa qîzin ê mezin bibe.* a baby girl will be born to her (lit. 'will become'), that baby girl will grow up.
- 0018 *Bibe çaxê wê yê zewacê were.* She will reach the age for marriage.
- 0019 *Ewê bi nod û neh heba ra serê xwe dayne.* She will sleep with 99 (men) (lit. 'place her head with')
- 0020 *Iliškî bike bi nod û neh heba ra, ê sedî jî tu bî.* (She) will enter relationships with 99, and the hundredth will be you.
- 0021 *Teze tu yê bi helalî ya xwedê ewê mar bikî.* Then you will marry her in a religious ceremony."
- 0022 *Mihemed ji xwe ra disekine, ê dibê: "Ew qîza kû teze were dinyayê, emrê min pencî sal e, ez wê çaxê dibim heftê sal,* Mihemed paused, thinking to himself: "If that girl should be born now, when I am 50 years old, then I will be 70
- 0023 *îcar bi sed merifê ra razê, bi nod û neha ra razê, ê sedî jî ez bim.* when she has slept with 99 men, and the hundredth will be me.
- 0024 *Heyran min ne lazim e vî qederê ye jî."* Heyran, I don't need this destiny!"
- 0025 *Ê de lawê Harunê Reşît e, zêrê wî pir e, zengîn* Well of course he was the son of Harunê Reşît,

- e.
- 0026 *Çend merifa digre her malekî, dûra, xaniye xwe, malê li dora wî, her malekî pêyakî dide berê,* he possessed much gold, he was wealthy. He gathered some men at each house, that is, at those houses that were around his own house, posting a watchman in front of each house, saying:
- 0027 *dibê: “Di nava wê heft rojê han da, jina kî welidî, dergûşa qîzin anî hat, hun malûmatê bidin min.”* “Within these seven days, if a woman gives birth, bearing a baby girl, you will inform me of this.”
- 0028 *“Bas e.” Du, sê roj dikeve arê,yekê wî têdibêje: “Mihemed, welle, jina filan cinarê me welêdiye, dergûşekî qîzin jê ra bûye.”* “Good!” (they reply). Two or three days pass, one (of the men) comes and says: “Mihemed, by God, a woman from some neighbour has given birth, a baby girl is born unto her.”
- 0029 *Mihemed wê çaxê înan kirîye kû ewan falçîyana, falê wan rastin.* Then Mihemed believed that the foretellings of the fortune tellers were right.
- 0030 *Direve tere wê derê, ji dê û bavê wê ra dibê: “ewê dergûşa xwe hun nadin min?”* He goes running there and says to the mother and father of the baby: “Will you not give me this baby of yours?”
- 0031 *“Heyran!”, dibê, “teze hatiye dinê, hîna me gocî nekiriye, tu çer dikî wê dergûşê?”* “Heyran!”, (they) say, “it is only just born, we have not yet given it its first breastfeed, what are you going to do with this baby?”
- 0032 *“Yahut”, dibê, “ez li ber wê zêr dikişînim didim we, ewê dergûşê bidin min.* “Listen” (he) says: “I will give you the baby’s weight in gold (lit: weigh/draw gold on the baby) (if) you give me that baby.
- 0033 *Ez kurê Harunê Reşit im, xatirê min qasê dergûşekî tune?”* I am the son of Harunê Resît, is not my good will worth as much as one baby?
- 0034 *Li ber wê zêr dikişînim, didim we, ewê dergûşê teslîmê min bikin.”* I will draw the child’s weight in gold and give it to you, (if) you will surrender the baby to me.”
- 0035 *Xatirê wî naşkînin, eger ji zorê be, ji xatir be, tesîra wî zêde bûye, digire* They do (can) not offend him (so they complied), whether through coercion, or through good will, his influence was great.
- 0036 *li ber wê dergûşê zêr dikîşîne dide wan, dergûşê tîne tê.* (He) draws the child’s weight in gold and gives it to them, (then) fetches the baby.
- 0037 *Tîne tê, sandiqekî ji hesin dide girêdanê.* (He) fetches (the baby), (then) gets a chest of iron to be lashed (presumably onto a horse).
- 0038 *Kêra xwe digre dide wêdera qirika kecikê, diqelêşe tîne hetanê vira.* (He) takes his knife there, places it against the girl’s throat, tears it open till here.
- 0039 *Carekî ewha davêjê, rep carekî ewha davêjê, movêkî ziravîya pišta keçikê bi hevra dimîne.* (He) repeats his actions, (until only) a thin slice of the girl’s skin was left intact.
- 0040 *Wer dike perçe-perçe dike bi kêrê, digre dike hundurê sandiqê.* He does like this (accompanying gestures), cuts (it) into pieces, takes (it) and puts (it) inside the chest.
- 0041 *Dibe tere cîkî dûr, ewê sandiqê jî digre davêje behrê û vedigere tê.* (He) takes (it) to a distant place and throws that chest into the sea and returns.
- 0042 *Dibe sibe, merifekî jî heye, ewledê wî tunenin,* Morning comes, there is a man, he has no children,
- 0043 *karê wî ew e, tere masîyan ji denizê digre tîne, difroşe, îdara xwe bi wî dike.* his work is thus: he goes fishing, brings fish from the sea and sells them and in this manner he makes his livelihood.
- 0044 *Ew ro sibê zu radibe, dibê: “Jinik, welle, ez ê herim fêlan derê,* That day he gets up early, saying “Wife, well, I will go to such-and-such a place,
- 0045 *zûda torçî neçûne wê derê, kesî masî li wir negirtine, masîyê wê derê pir in.* there are no fishermen there early, noone is fishing there, there are many fish there.

- 0046 *Ez ê herim wê derê, tora xwe bavêjim, masîyan bigrim.* There I will go and cast my nets to catch fish.”
- 0047 *Radibe, bi şevda hespê xwe girê dide ereba xwe û berê xwe dide wê derê.* In the evening he sets off, harnessing his horse and cart and heading for that place.
- 0048 *Tere wî cîyê kû Mihemedê Harunê Reşît sandûqa qîzîkê avêtiye denizê.* He reaches that place where Mihemed of Harûnê Reşît had thrown the chest with the girl into the sea.
- 0049 *Tere tora xwe davêje, bala xwe didê tor giran e, nayê.* (He) goes and casts his net, then realises that his net is heavy and doesn’t come out.
- 0050 *Hespa davêje torê, kaşdike, dertîne derva, bala xwe didê sandiqekî.* (He) lashes his horse to the net, pulls, and on drawing (the net out of the water) he sees a chest.

1.2 Utterances 0051–0100

- 0051 *Pir şadibe. Dibê: “Eva gelo xezîne ye, di vê sandiqê da, defîne ye, eva aidê kîjan paşayê ye, ji kîjan gemiyê da ketiye,* He is overjoyed, saying: “That is certainly treasure, in that chest there, a fortune, whichever Pasha it may belong to, from whichever ship it may have fallen,
- 0052 *xwedê da min. Ez îcar zengîn dibim.”* God has bestowed it on me. This time I will become rich.”
- 0053 *Sandiqê digre davê ser erebê, tora xwe lê dipêçe ji bo kû kes nebîne.* (He) takes the chest and puts in on his cart, wrapping (it) in his net so that noone will see it.
- 0054 *Tîne tê derê malê, hîna sibe zû ye.* (He) brings (it) home, it is still early in the morning.
- 0055 *Dengê nigê hespa, erebê ji ber derî tê, jina wî balikçî direve derwa.* When the noise of the horse’s hooves and the cart reach the door, the wife of that fisherman rushes outside.
- 0056 *Ê dibê: “Xwedê te bikuje, tu kura çû masîya, tu (ji?) kura hati? Tu kar û îşkê nakî, em tî-birçî di mal de mane.* Then she says: “May God kill you, where have you been fishing, where have you come from? You do nothing useful, and we are left hungry and thirsty at home.
- 0057 *Tu terî ber derê avê, “Ez terim masîya”, tu masîya nagrî naynî.* You go to the sea shore saying “I am going to catch fish”, (but) you don’t bring any fish (lit. ‘catch bring’).
- 0058 *Tu kura çû, tu kura hat?”Dibê: “Hiss! Jinik dengê xwe neke, Xwedê da me.* What are you thinking of?” (He) says: “Sssh! Wife, hold your tongue, God has been generous to us (lit. ‘God gave us’)
- 0059 *Min sandiqekî hesin ji denizê deraniye, hundurê wî tijî zêr û xezîne ye.* I pulled a chest of iron out of the sea, it is full of gold and treasure.
- 0060 *Têra me dike, em zengîn bûn.”* (It) will satisfy all our needs, we are (have become) rich.”
- 0061 *”Baş e”, tînin tîn hundurê malê, ew û jina xwe bi dorê dikevin.* (She replies:) “Alright”, (they) bring the chest inside the house, he and his wife gather around (the chest).
- 0062 *Bi kakûça kilît milîtê wî dişkenînin, wexta vedikin, bala xwe didinê cênazê keçîkekî teze.* With a hammer they break open the lock and fastenings, on opening the chest they see corpse of new-born girl.
- 0063 *Nûz e nûza wê ye. Qet qet kîrî, ema ne mirîye.* It is only just born, it has been cut up into pieces, but is not dead.
- 0064 *Jinik dibê: “Oof mêrik”, dibê, “Xwedê bela te bide, em li kû e, ew derdê han li ku te anî ew* The wife says: “O husband, may God send you misfortune, who do you think we are, where did

- jî nîšanê me da.”*
- 0065 Merik dibê: “Jinik, min heyran, ez çî zanim. you get this trouble here to show us?”
The husband replies: “Wife, my dear, what was I supposed to know?”
- 0066 *Min ji denizê deranîye, ez şa bûm, min go qey zêr û pere ne, min ji xwe ra ji denizê deranî, ez çî zanim kû dergûş e, min deranîye, anîye.* I pulled it out of the sea and was happy, thinking it was gold and money, I pulled it myself out of the sea, how was I supposed to know that it is a baby, I just pulled it out and brought it here.”
- 0067 *Dibê: “Jinik meraqa meke. Em ê herin gazî hekîma bikin bînin werin.* (He) continues: “Wife, don’t worry. We will go and seek out doctors and fetch them here.
- 0068 *Tedavîya vîya çêbûye bûye, nebûye ku wexta mirîye, em ê herin mezalekî bikolin têkin mezala.* Whatever treatment for her may be, if she should die, we will go and dig a grave and put (her) in the graveyard.
- 0069 *Eger kî sax bûye jî, ewled û tewledê me tu ne, em ê ji xwe ra xwedî kin. Bila bibe ewleda me, tu çîma meraq dikî?”* And if she should get well, we have no children, we will raise her ourselves. Let there be a child of our own — why are you worrying?”
- 0070 “Bas e.” *Ewana terin, gazî hekîman dikin, tînin tîn ser,* “Alright” (the wife replies). (They) go and summon doctors, bringing them (to the girl),
- 0071 *hekîm radîbin qetê wî didin hevdû, didirûn bi hevdû ra.* the doctors put her pieces together, sew them together.
- 0072 *Ew keçik namire, sax dibe, rep sax dibe.* That girl doesn’t die, she recovers.
- 0073 *Êdî wa xwedî dike, lê mêze dike, fena ewlada xwe pir ber sa dibe, keçik mezin dibe, dibe xort êdî.* So (he/she?) raises the girl, looks after her, takes pleasure in her like a child of their own, the girl grows up until she becomes adolescent.
- 0074 *Vir da, wê da, çavê xwe rast-çep digerîne li xorta.* This way, that way, she casts her eyes at the young men.
- 0075 *Gundî fark dikin, hayê gundîyan jê heye, kû keçik rahatsızîya dike.* The villagers notice and realise that the girl is causing trouble.
- 0076 *Rokî dişînin dû bavê keçikê.* One day they send for the girl’s father.
- 0077 *Dibên: “Heyran, gundê me da hetanî niha huzursizîya aha tunebû, nebûye icad.* (They) say: “Listen, up until now there has never been (such) bad habits in our village, never such unrest.
- 0078 *Ew qîza te rahatsızîyê çêdike, ew ê gencê gundê me xirab bielimîne.* That girl of yours is causing trouble, she is getting the youth of our village into bad habits.
- 0079 *Ya tu vê qîza xwe ji gund derîni, ya tu yê mala xwe barbikî, ji gund derkevî.* Either you drive that girl of yours out of the village, or you move your household, leaving the village.
- 0080 *Ji herdû rêya, tu yê rêkî qebul bikî, em aha qebûl nakin.* Of these two choices (lit. ‘roads’), you choose one, we will not tolerate such a state of affairs.
- 0081 *Gencê gundê me, xortê gundê me xirab dielimin.* The youth of the village, the young people, are learning bad habits.
- 0082 *Em gişt xwedîye namusê, çoluk-çocigin, em îdare nakin nav van.”* We are all persons of honour, but the children, we cannot cope with them.”
- 0083 *Dibe êvar, merik tê mala xwe, ji jina xwe ra hal û mesele min gotîye ev. (syntax unclear) “Tu dibêji çî?”* In the evening the man comes home and tells his wife the events that I recounted. “What do you say?”
- 0084 *Ê jinik dibê: “Ma (...) em xanîyê xwe, cî û warê xwe naterikînin.* Then the wife says: “We should not leave our home and surroundings.
- 0085 *Qîza me jî nîne, me xwedî kirîye, mezin kirîye, îro jî ketîye rêya xirab.* We have no daughter, we brought (her) up, let her thrive, but now she has got into bad habits.
- 0086 *Em ê bigrin ji mala xwe derînin, kuda hatîye — xwedê tevayê îşê wê — bila wêda here.”* Let us throw her out of our house, wherever it is that she came from, may God be with her, let her go back there.”

- 0087 *Keçikê digrin, dibên: “Qiza min, welle tu, rêya te ne rêkî baş e.* The take the girl, saying: “My daughter, well, your way of life is not a good one.
- 0088 *Tu yê ji mala min derkevî, tu qîza min jî ninî.”* You will leave our house, you are not our daughter.”
- 0089 *Ama, ji piçûktî çer çûne ji denizê deranîye, anîne hatine (...) jê ra gotîye. (...)* But (he) had told her how, when she was small, they (?) went and pulled her out of the sea and brought her home.
- 0090 *Dibê: “Tu yê mala min biterikînî, tu ne qîza min î,* He says: “You will leave my house, you are not my daughter,
- 0091 *tu êdî mezin bûyî, tu dikarî herî her derê. Êdî ji te ra oxir be, mala min biterikîne.”* now you have grown up, you can go anywhere. So for now go in peace, leave my house.”
- 0092 *Kecik tere, adekî biniya gund da, ormanekî heye, xortê hevalê wê pirin.* The girl went, there is an island down below the village, there is a wood there, she has many young friends.
- 0093 *Jê ra ê kû doşekê dibin terin, ê balîfê dibin, ê lehêfê dibin, ê xwarinê dibin terin.* Some (of them) brought her a mat (for sleeping), some brought a pillow, some brought a quilt, some brought food.
- 0094 *Gein,terin, didizin tînin û tîn, navê ormanê da çîkî, holikekî ji keçikê ra çêdikin, yataxekî datîninê.* They were youths, they went and stole (the things), brought them back, in the middle of the forest they made a place, a hut for the girl, they set up a bed for her.
- 0095 *Gerçek bi kêra cema dibe, heqekî bol jî distîne,* Indeed, with whomsoever she slept, she received handsome reward,
- 0096 *û li cem xwe jî bendekî digre, bi kêra cema dibe, girêkekî li wê bendê dixîne.* and around her waist she bound a sash, whomsoever she slept with, she tied a knot in her sash.
- 0097 *Rokî bendê xwe dertîne, dijmêre, bala xwe didê bi nod û neh merîfa ra cema bûye.* One day (when) she took off her sash and counted (the knots) she realised that she had slept with 99 men.
- 0098 *Keçik wê çaxê rûdine, dişunmiş dibe “Heyran”,* At that moment the girl sat down, pondering, “It’s incredible”,
- 0099 *dibê, “ez zarok bûme, biçûk bûme, min girtine, biçax kirine, qet kirine, avêtine, kirine sanduqa hesin avêtine binê behrê.* she thinks (=says), “I was a child, they took me, cut me up with a knife, threw, put (me) in a chest of iron and threw (it) into the sea.
- 0100 *Balikçî min deranîye, anîye hatîye, ez mezin kirim, xwedî kirim.* The fisherman pulled me out, brought me back (to his home), raised me.

1.3 Utterances 0101–0150

- 0101 *Îro jî êdî wexta min, ez bûme xort, ev rêya xirab çîye min pê girtîye?* And now, now I have become an adolescent, this evil way of life, why is it that I chose it?
- 0102 *Welle ez tobedar im, ez ê wî isî biterikînim.”* Well, I am repentant, I will quit this way of life.”
- 0103 *Heval mevalê wê kes tune bûye. Hema keçik holika xwe diterikîne, bi çîyê da.* She had no friends, noone at all. Immediately she abandoned her hut for the mountains.
- 0104 *Birê dikeve berê xwe dide çîyê tere, tere (...) diqelibe alîyê wîyalî, bi rojan tere, tere.* (She) took to the road, heading for the mountain(s), on and on, turning this way and that, for days (she) kept going.
- 0105 *Devê denizê li şehrekî derdikeve, ewa dikeve nava soqaqekî, çarşûye da tere.* At the coast (lit. ‘mouth of the sea’) she turned up at a town, there she entered a small street and wandered through the marketplace.
- 0106 *Rastê pîrekî tê, rep rastê pîrekî tê, dibê: “Dayka pîrê tu min naxî qîza xwe, ez bibim* She met an old lady and said: “Old lady, don’t you want to make me your daughter, I will be

- 0107 *qîza te, tu jî bibî dîya min,
ez bê kes im, bê xwedî me.”*
- 0108 *Dibê: “Qîza min, lawa, ez pîr im, extîyar im,
perê min tu ne, ez zengîn nînim, ez feqîr im.*
- 0109 *Tu geî, mesref ji ta re lazim e, çek û rêhal ê
teze ji te ra werin kirinê*
- 0110 *(...) ez nikarim te xwedî kim.”*
- 0111 *“Weyê dayka pîrê”, dibêje, “perê min pîr e.*
- 0112 *Ez te jî xwedî dikim, xwe jî xwedî dikim. Tiştê
ez ji te dixwazim sadece tu yê odekî bidî min.*
- 0113 *Royê sê dan nanê min bidê min, ez ji xwe ra
royê pewext desmêja xwe digrim, nimêja xwe
dikim, gazî xwedê dikim, başqa tişteki nakim.
Êbadetê xwe dikim.”*
- 0114 *“Ê qîza min law,” dibê, “wexta tu ewledekiya
aha yî ser çavan, tu ewleda min î, ez jî dîya
te.”*
- 0115 *Ê de perê qîzîkê heye. Qîzîkê gotîye: “Perê
min pîr e, pîrê jî şîrîn e Pîrê (...) perê me heye,
Pîrê!”*
- 0116 *(...) Hema serê dide ber hembêza xwe mirç û
tere çavê wê paçî dike.”*
- 0117 *“Way qîza min lawo, tu qîza min î” û hiltîne
dibe terin malê.*
- 0118 *Dibe terin malê. Dikeve odekî, derî bi ser xwe
da digre, ji xwe ra gazî xwedê dike:*
- 0119 *“Yarabbî min ewqasa gune kir, ewqasa îş kir,
tu min afû bikî.”*
- 0120 *Bila ew wê derê biskinin.*
- 0121 *Mihemedê kurê Harûnê Reşîr edî yaşlî bûye,
rûyê wî spî bûye, ruyê xwe berdaye hatîye
wêdere. Rokî gazî çend hevalê xwe dike,
dibêje: “Were,*
- 0122 *em ê li ser denizê rê hildin herin, em berê xwe
bidin bajarê Stembolê.*
- 0123 *Heta wê derê em ê herin. hem ji xwe ra li
dinyê digerin, tûr davêjin,*
- 0124 *hem jî hela qet rastê qîza esil temîzekî, paşakî,
axakî, maqûlekî nayim.*
- 0125 *Ez ji xwe ra bizewîcim, belkî qedera min jî
vedibe.*
- 0126 *Baş e. Ew tevî seş-heft hevalen xwe radibin,
dikevin,*
- 0127 *artik bot bûye, gemî bûye, qayîk bûye,
dikevinê.*
- 0128 *Li ser denizê tîn, tîn li wê şehre qîzîk lê, tîn
li wê şehre derdikevin,*
- your daughter and you will be my mother,
I have noone, no guardian.”
- (The old lady) says: “My girl, I am an old lady,
old, I have no money, I am not rich, I am poor.
- You are young, it will be necessary to spend
money for you, clothes and things for you will
be bought
- (unclear) I cannot look after you
- “Old lady”, (she) says, “I have much money.
- I (can) look after you, and look after myself. The
only thing I want from you is that you give me a
room.
- Three times a day you shall give me food, and
for my part I will perform my ritual absolutions
five times a day, call on God, I shall do nothing
else. I will worship (God).”
- “Well my girl”, says (the old lady), “if you are a
child like this please feel free, you are my child,
I am your mother.”
- And there was the girl’s money. The girl said:
“I have much money, and money is sweet, we
have money, Old lady!”
- Straight away they hug and kiss each other
loudly (exact interpretation unclear).”
- “Well my girl, you are my girl!” (she) takes her up,
brings her (lit. ‘brings goes’) home.
- They go home, (the girl) enters a room, closes
the door, calls on God, saying:
- “My Yarabbî I have sinned so much, I have done
so much evil, forgive me!”
- So they stay at that place.
- In the meantime Mihemedê the son of Harûnê
Reşîr had aged, his hair had turned white, his
beard had grown down to here (with accompa-
nying gesture of the hand). One day he called
some of his friends saying:
- “Come, we will make our way to the shore of the
sea, we will head for the city of Istanbul. We will
go as far as there.
- We will have a look around the region, take a
trip,
- and perhaps we will come across a girl of good
breeding, from a Pasha, an Agha, a man of learn-
ing.
- That I might marry her, and my destiny reach its
fulfillment.
- “Agreed” (they say), and he sets off together
with six or seven of his friends,
- and there are boats, canoes, ships, and they em-
bark on them.
- The reach the sea, to the town in which the girl
lives, they enter that town we will take a look

- 0129 *“Heyran”, dibêjin, “ew çi qesabakî xweş e, em ê ji xwe ra li vê qesaba yê bigerin.”* around this town. saying “Heyran, what a pleasant little town,
- 0130 *Müzê wî, antîqê wî ewê wî bibînin.* We shall visit the museum, the antique ruins, this and that.
- 0131 *Em ê nanê nivro jî li vê şehre han ê bixwin, û em ê werin têkevin qayîka xwe, rêya xwe devam bikin.* We shall eat our midday meal in this town, then enter our boat again and continue our journey.”
- 0132 *Terin digerin, “Ha em li vî çarşiyê bixwin, ha em li vê loqantê bixwin” derken* They stroll about, and just as they say “let us eat at this marketplace, let us eat at this restaurant”,
- 0133 *nebe nesîp, wî soqaqa kû dîya keçikê têda, bi wî soqaqê da dimeşin, êdî herin sîyar bin.* through a stroke of good fortune it is the street where the mother of the girl lives, they are walking through that street, they have already dismounted (from their horses).
- 0134 *Rastê pîrê tèn, rastê pîra dîya keçikê tèn.* (They) encounter the old lady, the old lady who is the mother of the girl.
- 0135 *Ew jî yanî girgir olsun, dibên: “Dayka pîrê tu mêvana xwedî nakî?”* He says, you know, just jokingly, “Old Mother, will you not take us in as guests?”
- 0136 *Pîre aha li wan mêze dike, ser û guhê wan.* The old lady looks at them (lit, ‘their head and ears’) in such a manner.
- 0137 *De wê çaxê çek û rahalê zengîn û feqîra jî hewdû ayrî bûye, pîrê aha li wan mêzedike, “yahu” dibe, ds“wellehî hûn fena paşa nin, fena axa nin, zengîn in.* You know in those days the clothes of the wealthy and the poor were different, the old lady looks at them like this and says: “Well by God you look like Pashas, like Aghas, like wealthy people.
- 0138 *Ez pîrekî feqîr im, perê min tune, cîyê min qetek xesîra min heye. Ez fedîdikim we bibim mala xwe.”* I am a poor woman, I have no money, my house, I have just one sleeping mat, I would be ashamed to take you into my house.”
- 0139 *Ê te dît merifê berê eslê wî temîz nefsa xwe dişkênandin.* And as you see, man in former times was of pure background, they did not indulge themselves.
- 0140 *Kû pîrê dibê: “Qetekî xesîra min ez ewqas feqîr im.”* When the old lady says: “I have but one sleeping mat, I am so poor.”
- 0141 *Dibên: “Em niha pišta xwe di pîrê da kin, ji me ra fexir çêdibe, kibîr çêdibe.* (They) say: “If we now turn our backs on the old lady we will be committing arrogance and haughtiness.
- 0142 *Welle em ê herin ser wî xesîra pîrê rûnin, bila dilê wê rehet bibe.* By God, let us go and sit on this sleeping mat of the old lady that her mind may be at peace.
- 0143 *Ji bo qelbrihetbûna pîrê, em ê herin ser xesîra wê rûnin.”* To ensure the peace of mind of the old lady, we will go and sit on her sleeping mat.”
- 0144 *“Dayka pîre”, dibêjin, “Qet merak neke, em ji te ra nabin bargirani.”* “Old lady”, they say, “don’t worry, we will not be a burden on you.”
- 0145 *Dertîne deh zêra davêje pêşa pîrê, dibê: “Here ji me ra, xwarin, marinê bine, em ê werin li ser xesîra te rûnin,.* (He) takes out ten pieces of gold and puts them in front of the old lady, saying: “Go and fetch us food and refreshments, we shall come and sit on your sleeping mat,
- 0146 *tu ji me ra nan çêbikî* you prepare a meal for us.
- 0147 *Em ê nimêja xwe ya nivro bikin, bidin rê herin.”* We shall go and make our midday prayers, go on your way.”
- 0148 *Ê pîrê çav li zêra dikeve, heşt zêra davê bêriya xwe, tere bi du zêra mesref dike tîne tê, Xwedê daye pîrê.* When the old lady caught sight of the gold pieces she put eight in her pocket, she went and spent two pieces (for food etc.), brought (it)

- 0149 *Pîre tîne ji wan ra nan-man hazir dike, wana jî radibin nimêja xwe dikan, ser û çavên xwe dişon, pîrê nan hazir kirîye ji wan ra, türlü türlü yemek, ewan nanê xwe dixwin.* back, God had blessed the old lady. The old lady prepared a meal for them, they for their part performed their prayers, washed themselves, the old lady had prepared a meal for them, all different kinds of food, they ate their meal.
- 0150 *Hevalek dibê: “Dayka pîrê tu pir digerî,* One of the friends says: “Old mother, you get around a lot,
- #### 1.4 Utterances 0151–0200
- 0151 *qet qîzekî baş tune? Ewa hevalê me, kurê Harûnê Reşît e, navê wî Mihemed e,* is there no fine girl (anywhere)? This friend of ours is the son of Harûnê Reşît, his name is Mihemed,
- 0152 *emrê wî hatîye şeşt salî, hê nezewicîye.* he has reached the age of 60, he is still unmarried.
- 0153 *Qet qîzekî were bi esil tune, em jê ra bixwazin.”* Is there really no girl of good family that we could request in marriage for him?”
- 0154 *Pîre dibê: “Lawo (...) tu dibêjî “digere”, ez ne ji wan pîra me.* The old lady says: “Young man, (...) you say “get around”, I am not one of those old ladies.
- 0155 *Ez qîzê kesî jî nasnakim, yanliz qîzekî min heye,* I don’t know anyone, no girls (that I could be a matchmaker).” I just have my own daughter,
- 0156 *ez ê jê ra bêjim, eger pê razî bibe, ez ê bidimê.* I will speak to her, if she is happy with the arrangement, I will give her to him.”
- 0157 *Dibên: “Dayka pîrê qîza te li ku ye?”* (They) say: “Old mother, where is your daughter?”
- 0158 *Dibê: “Welle, wayê li wê dêra di odekî da ye, ez royê sê danâ nanê wê didimê, ew jî royê pewext nimêja xwe dike, gazî xwedê dike, efûya xwe ji xwedê dixwaze.”* (She) says: “By God, there she is over there, in a room, I give her three meals a day, and she performs her prayers five times a day, calls on God, begs forgiveness from God.”
- 0159 *Ewana (...) li cavên hewdû mêzedikin, “Kuro”, dibê,* They look at each other, “Boy (addressee unclear),
- 0160 *“mala te ava be. Eger qîzekî ewha, teqwa, baxlî bi xwedê be, (...) dernekeve der, ji xwe ra em li tişteki aha digerin, bira qet bavê wê paşa ne be,* may your house prosper (formulaic expression). If (she) is a girl so pious, so committed to God, she does not go out, we ourselves are looking for something just like that, even if her father should not be a Pasha, we are looking for something like that.”
- 0161 *ez li tişteki ewha digirim.” Ê dibe, “Pîrê (...) hela qîza te em bibînin.”* “Well then”, (he) says, “Old lady, let us see your daughter.”
- 0162 *Dibê: “Bisekinin, ez musadê jê bixwazim.”* (The old lady) says: “Wait, I will ask her approval.”
- 0163 *Tere, dibê: “law, qîza min, hal û mesela aha, tu dibê çi?”* She goes and says (to the girl): “Child, my daughter, the matter is like this (she explains), what do you say?”
- 0164 *Ê dibê: “Dayê, welle hela gazî kê , em hevdû bibînin.* “Then (she) says: “Alright Mother, you may call him that we may see each other.
- 0165 *Eger em bi hevdû qayil bibin,* If we are satisfied with each other, let it be so,
- 0166 *dibe, çima nabe. Kurê Harûnê Reşît e û di dinyê da naskirîye û belî însanekî ye, ez ê bistînim.”* why should it not? (He) is the son of Harûnê Reşît, a man reknowned throughout the world, an eminent person, I would take him.”
- 0167 *Pîre wan tîne, bi rûyê hevdû dixîne, bi hevdû* The old lady brings them and puts them oppos-

- qayîl dibin.
- 0168 *Radibin, bi dilê pîrê, pîrê razî dikin.*
- 0169 *Zêra didin pîrê, û keçikê hiltînin, bi xwe ra dikin qayîkê, vedigerin şehre Basrayê.*
- 0170 *Ewana vedigerin tên, şahî dikeve nava Basrayê, dibên: “Welle, Mihemedê Harûn ê Reşît zewicîye. Ji xwe ra qedera wî vebû. Teze vebûye.”*
- 0171 *Pir şadibin, çil royê şenlik çêdikin, def, dawet, her tişt, eglenca xwe dewam dikin, piştî çil roya wexta wana terin, mahra wan dibirin.*
- 0172 *Dibin terin oda xwe. Wexta keçik çekê xwe dertîne, Mihemed lê mêzedike, dewsa kêra û birîna wa li çekê.*
- 0173 *Çekê wê top dike, davê navê çava, dibê: “Xwedê bela te bide, axir ez ji te xilas nebûm.”*
- 0174 *Keçik dibê: “Min heyran, tu çima hêrs dibî bi min ra, tu hatî, te min qayîl bû, te min girtîye, anî hatîye, wexta tu bi min qayîl nabî, min bigre çardîn bibe dayne dewsa min, bide rê were, tu ji xwe ra, ez ji xwe ra.”*
- 0175 *Mihemed düşünmüş dibê, “Hayran, ewan mêrikana fal danîn, ji min ra got qedera te ew e.*
- 0176 *Xêr ji vîya qedera te tune.*
- 0177 *Ez ê mecbûr, histîyê xwe xwar bikim, bi wê qederê razî bibim.*
- 0178 *Hema, ewan remildaran, falçîyan jê ra gotibû: “Ew ê li cem te bibe dîya du lawan.*
- 0179 *Ecelê wê bi destê pirabokê be, ewan pîrabokê hanê konik çêdikin ya.*
- 0180 *Ecelê wê yê bi destê pîrabokê be.*
- 0181 *Pîrabokê lê bixe, bikuje.*
- 0182 *Ê de, lawê Harûnê Reşît e, zengîn e, bi qedera xwe razî dibe, ji jina xwe hezdike.*
- 0183 *Emîr dide ser hostan, mîmaran, mihendizan, dibê: “Hunê koşkekî (...) çêbikin.*
- 0184 *Zexîra min, ava min kanîya min, her tiştê min ê di hundur da be.*
- 0185 *Hûn ê pêderîyan li dû hevdu lê xînin.*
- 0186 *Qulê kilîtê li dîwar be, li wê derê ez ê kilîtê lêxim, li vira derî ve be.*
- ite each other, both are in agreement with each other.
- They get up (?), the old lady gives her consent.
- They give the old lady gold and take the girl with them, putting her on board the boat, and returning to the city of Basra.
- When they return home there is rejoicing in Basra, (the people) saying “By God, Mihemed of Harûnê Reşît has married, his destiny has come to pass, it has now come to pass.”
- They are overjoyed, and celebrate 40 days, drumming, dancing of all types, their enjoyment continues, after 40 days they go to consummate the marriage.
- (They) take them and they go to their room. When the girl takes her clothes off Mihemed looks at her, (seeing) the traces of such knife-wounds and cuts on the girl.
- (He) gathers up her clothes, throws them in her face (lit. ‘eyes’), saying: “May God curse you, in the end I could not escape from you.”
- The girl says: “I am amazed, why are you angry with me, you came, you were satisfied with me, you took me, brought me (here), if you are not satisfied with me (now) take me and bring me back to my place, come back here you for your part, I for mine.”
- Mihemed thought to himself: “Heyran, those fortune tellers cast (their dice), telling me that my fate is this.
- There is no goodness other than this your fate. I am obliged to bow my head in acceptance of this fate.”
- In addition, those fortune-tellers, soothsayers, had (also) said: “She who is with you will be the mother of two sons.
- Her appointed hour of death will be at the hands of a witch, those witches who make konik (the meaning of this word is unclear.)
- Her appointed hour of death will be at the hands of a witch.
- The witch will strike her, killing her.
- Well of course he is the son of Harûnê Reşît, he is rich, he accepts his fate and loves his wife.
- (He) give orders to master craftsmen, architects, engineers, saying: “You will (...) build a palace.
- Let there be stocks of food, drinking water, a well, everything of mine inside.
- You will make five doors, each one shutting after another (unclear).
- Let the keyhole be in the wall, there I will insert the key and here the door will open.

- 0187 *Bila qul di wî bînayê da tunebin, pîrabok tê ra nekeve hundur.* Let there be no hole in that building that a witch might be able to enter through.
- 0188 *koşkekî were dide çêkirinê.* (He) gives orders that such a palace be built.
- 0189 *Derê wî temam otomatîk, qul tê da tunenin.* The door (is) completely automatic, there are no apertures in it.
- 0190 *Cîkiya kû pîrabok bikaribe, mêşekî, têra bikeve hundurê xanî tuneye.* There is no place through which a witch, a fly, could enter.
- 0191 *Her tişt, xwarin, (...) Mihemed bi xwe wexta derî derî vedike.* Everything, food (...) Mihemed himself opens the doors one after another.
- 0192 *Pir dîqatlice derî vedike, erdê kontrol dike, dîwaran, salonê kontrol dike.* (He) opens the doors very cautiously, checking the ground, the walls, the living room.
- 0193 *Wî derîyî bi xwe kîlît dike, îcar derî dinê vedike.* He locks this door, then he opens another door.
- 0194 *Wara têra hundur tê, ihtîyacê xwe dibîne. Rojekî tere neçirê, dû law jê çêdibin.* In this manner he enters the house and fulfills his needs. One day he goes hunting, two sons of his had come into existence (an afterthought added to show that the fortune tellers' had been correct).
- 0195 *Tere nêçirê, jina wî jî radibe, desmêja xwe digre nimêja nivro bike.* One day (he) goes hunting, and his wife sets about taking her ritual ablutions in order to perform her midday prayers.
- 0196 *Mihemed jî ber bi mal tê.* As for Mihemed, he is just coming to the house.
- 0197 *Wexta li ser nimêjê dibê: "Allahû ekber", bala xwe dide pîrabok jorda xwe berdide jêrê û tere jorê.* She is just starting her prayers, saying "Allahu akbar" when she notices a witch up above, letting herself down and then going up (again).
- 0198 *De jê ra gotîye, li ser nimêjê di dilê xwe de dibêje: "Dêmek ecelê min bi destê te ye, bise ez nimêja xwe temem bikim, welle ez ê te bikujim."* Of course (Mihemed) had told (her about the fortune-tellers' warnings), at the start of her prayers (she) says: "So my death will come at your hands, just wait till I have finished my prayers, by God I will kill you."
- 0199 *Wexta ewa silav didê, pîrabok jorda xwe berdide tê jêrê.* When (the wife) greets her, the witch lets herself down and descends (to the floor).
- 0200 *Nigê wê pêxas e ya, nigê xwe dide ser pîrabokê, pîrabokê bipelixîne, wexta nigê xwe da ser, pîrabok jêlî li binê nigan dixîne.* She (=the woman) is barefoot, you know, she puts her foot over the witch to crush her, (but) as she is about to put her foot down, the witch strikes the sole of her foot from below.

1.5 Utterances 0201–0207

- 0201 *Qirîn jê tê, wê çaxê Mihemed jî derî vedike, dikeve, dibê: "Çer bû?" Dibê: "Welle pîrabokê li min xist."* She screams (lit. screaming comes from her), at that moment Mihemed opens the door, enters and says: "What happened?" (She) says: "By God, the witch has struck me."
- 0202 *"Wey la mala xwedîyê te şewitî, tu di kure ketî hundur?"* (Mihemed says:) "Oh, the house of your master is destroyed, through what did you (the witch) enter here?"
- 0203 *Ne qul dibê di wî bînayêda heye. Ne ku cîyê tu tê ra were wî dinyayê."* There is no aperture in this building, nor any place through which you could enter this area.
- 0204 *Dêmega qedera ji cem xwedê da çêbûye, ew qedera cîyê xwe dibîne, rast e.* That means destiny is with God, (He) lets destiny come to pass, that is right.
- 0205 *Gotina wan falçîyan hatîye cî.* The words of those fortune-tellers had come to pass.

- 0206 *Mihemedê kurê Harunê Resît bi wî qederê razî dibe, bi wê jinikê ra dizewice, dibe dîya du lawan, ecelê wê bi destê pîrabokê tamam dibe.* Mihemed son of Harûnê Resît accepts this fate of his, marries this woman, she becomes the mother of two sons, her appointed hour of death is at the hands of a witch, it is complete.
- 0207 *Welle, çîroka min çû dihara, em bi qeyda Kurdistana berî bibêjin, rehma lê dê û bavê hazir û gûhdaran.* By God, my story has come to an end, let us say in the manner of Kurdistan of old, may mercy be on the fathers and mothers present (and/of?) the listeners.

2 muserz02

2.1 Utterances 0001–0050

- 0001 *[in the the first 16 seconds various listeners speak to the narrator; their contributions are not transcribed] Îja damarya qîzkê hebûye [followed by some unclear / incomplete utterances]* At that time the girl had a stepmother.
- 0002 *Navê qîzkê (...) Fatik bûye.* The name of a girl was Fatik.
- 0003 *Navê qîza damarya wê jî Eyşik bûye.* And the name of the stepmother's daughter was Eyşik.
- 0004 *Îja daîme çûne ber dewar bi hev ra.* At that time (they) would always go to (tend) the cattle together.
- 0005 *Çêleka diya Fatikê daîme li dewar xistîye, nehîştîye Eyşik rûnê.* The cow of Fatik's mother always struck at the cattle, (it) did not let Eyşik have any rest.
- 0006 *Fatik jî (...) teşîya xwe dibe, dirêse, bar dike.* As for Fatik, she takes her spindle, spins, loads (the yarn into a ball).
- 0007 *Êvarê tê wî giloka xwe tîne dide damarya xwe.* In the evening (she) comes, (she) takes her ball (of thread), gives (it) to her stepmother.
- 0008 *Îja damarî li qîza xwe dixê, dibê: "Çima ew êtim e, ew tere ber dewar, ew royê teşîya xwe aqasa dirêse!"* Then (upon seeing this) the stepmother beats her daughter, saying: "Why (can she spin so much wool), she is an orphan, she tends the cattle, (she) spins this much (with) her spindle in a day!
- 0009 *Çima tu jî?" Dibê: "Dewar nasekine."* And why (can't) you?" (Eyşik?) says: "The cattle do are too unruly" (lit. 'don't stop', it is unclear who is speaking here).
- 0010 *Qîzik jî nizane çêleka diya wê lêdixîne, nahêle.* And the girl didn't know (that) the cow of her (=Fatik) mother butts (the other cows), does not leave (them) in peace.
- 0011 *Îja wê çaxê cardinê tîne qeda xwe tê dide. Dibê: "Çer bûye, çer nebûye". Dibê: "Welle ava filan çêleka hana li dewar dixîne."* Then once again (the mother) nags at her (Fatik). (The mother) says: "(tell me) what happened, what didn't happen? (i.e. what's going on?)" (Fatik) says: "Well some cows there butt at the cattle."
- 0012 *Dibê: "Lema ez nikarim teşîyê birêsim."* (Fatik) says: "That's why I cannot spin."
- 0013 *Rokî (ji) mêrê xwe ra dibê: "Ez nebîranîya dikim. Tu yê ji mi ra wê çêlekê şerjê(bi)kî, çêleka diya Fatikê şerjê(bi)kî."* One day (she) says to her husband: "I have a craving for something: You will slaughter that cow for me, (you will) slaughter the cow of Fatik's mother."
- 0014 *Fatik jî pir bedew bûye.* And Fatik was very beautiful.
- 0015 *Tîne, dibê: "Tu şerjêbike." Waya jî dibê: "Ez çer çêlekê şerjêkim." Dibê: "Welle tu yê şerjêkî."* (She) brings (it), saying: "You will slaughter it." And he says: "Why should I slaughter the cow?" (She) says: "By God, will you slaughter (it)."
- 0016 *Tîne wê çêlekê şerjêdike,* (He) slaughters that cow.
- 0017 *Digurê, Wî goştê wê gava tîne bi qîzkê û diya wê were tel bûye, fena jehrî. Gava Fatik jî dixwe pir pê xweş bûye.* (He) skins (it). When (he) brings the cow's meat, (it) tastes bitter to the girl and her mother, like poison. But when Fatik ate (it), she became very joyful through it.
- 0018 *Ew ji teref xaliqê alemê hestîyê wî tîne ziman.* Through the Creator of the World its (the cow's) bones, acquire (the gift of) speech.

- 0019 *Dibê: “Tu yê hestîyê mi biherî, di afirê mi da bike çel.”* (The remains of the cow?) say: “You will take my bones and bury (them) in my manger (lit. ‘put in a hole’).”
- 0020 *Dibê: “Gava kî tu hat li cem mi, ez (...) (ji) te ra qise dikim.* (They) say: “When you come to me, I talk to you.
- 0021 *Gava ke ew derî bi ser te da kilît (di)kin, terin malê, ew terin deweta, tu di mal da dimînî.”* When they close the door on you, they go to the wedding celebrations, you are staying at home.”
- 0022 *Dibê: “Tu werî (...) hema ser ewa mi bigrî, ez bi te ra qise dikim. Tu yê derî kilît kî, herî. Nêzîka ew hatin malê tu jî berîya werî malê.”* (They) say: “Then you come immediately, cry over these (remains) of me, I talk to you. Then you will lock the door and go. Shortly before they come home, you come home first.”
- 0023 *Ava jî dibê “Erê.”* And she says “yes.”
- 0024 *Gava tînin dîkin qelî, qa jinik nikare bixwe. Ne ew, ne qîza wê. Ne Eyşik dixwe, ne diya wê dixwe.* When (they) bring (it and) make (it into) qelî, the woman cannot eat (it). Neither she nor her daughter. Neither Eyşik, nor her mother eats (it).
- 0025 *Ava jî hema ji xwe ra wer royê hinkî dixwe, hestîyê wê bi dizî wan dibe, dike afirê çêleka diya xwe.* But she (the girl) always eats a little bit every day, stealthily carries its bones (and) puts (them) in the manger of her mother’s cow.
- 0026 *Diha wer dimîne, rokî, dudu, sisê (...). Dewet hebûye.* It stays that way a while, one day, two, three (...). There was a wedding ceremony.
- 0027 *Fatik pir bedew bûye. Şimika nigê Fatikê jî sade gi zîv bûye.* Fatik was very beautiful. And the slipper on Fatik’s foot was pure, all of silver.
- 0028 *Lawê pašê jî dilê wî pir dikeve Fatikê. Tere dewetê.* The son of the Pasha — his heart was very taken by Fatikê (lit.: his heart fell to F.) (She) goes to the wedding.
- 0029 *Ew damarya wê dibê tu yê (... , hesitations). Ew mêrkê lawê pašê dibê: “Ava şimika hanê li nigê kê were ez ji xwe ra dixwazim.”* That stepmother of her says: “You will (...). That man, the Pasha’s son, says: “That slipper there — on whoever’s foot it should fit (come), I desire for myself.”
- 0030 *(Interruptions from listeners) Di wê arê da wê sîtilê datîne (...).* In the meantime (her stepmother) places that cauldron (on the floor). (The story takes a rather unexpected jump back to the home of Fatik and her stepmother).
- 0031 *Dibê: “Ez heta ji dewetê têmê, ez û qîza xwe, tu yê wer bigrî hêsirê te va sîtila tijî bibe.”* (She) says (to Fatik): “Until I come back from the wedding, I and my daughter, you will cry so much (that) your tears fill that cauldron.”
- 0032 *Qîzik jî rûdine, digrî, rep digrî. Dibê: “Ez ê vê sîtilê çer tijî bikim?”* And the girl sits down, cries and cries. (She) says “How can I fill this cauldron?”
- 0033 *Tere ser afirê çêleka diya xwe, hestî jê ra tê ziman teref Xwedê da.* (She) goes up to the manger of her mother’s cow, it’s bones have acquired (the gift of) speech through God.
- 0034 *Dibê: “Here xwoya xwe rind têkî sîtilê, ava xwe berde, tijî ke, li hev xe, li hev xîne.* (The bones) say: “go, pour enough of your salt in the cauldron, put water (lit. ‘your water’) in it, make (it) full, mix, mix it up together.”
- 0035 *Xwey rind helîya, tu here ji xwe ra dewetê. Tu were xwe bixemilîne, here dewetê.* (When) the salt has thoroughly dissolved, you yourself go to the wedding. Come, adorn yourself, (and) go to the wedding.
- 0036 *Nêzîkiya ew û diya xwe hatin tu li pêşîyê were malê ji xwe ra li ser runê, bigrî. Ewa diha çi zanin?” (...)* Shortly before she and her mother arrive you should come home before them and come to the house, sit down in front (of the cauldron) by yourself and cry. What will they know?” (i.e. the

- 0037 *Va tere dewetê ji xwe ra dilîze.* stepmother and her daughter)
She goes to the wedding by herself, dances.
- 0038 *Gava damarya wê lê mêzedike, ji qîza xwe ra dibê: “Çavê vîya fena wê Fatika mala me ye.”* When her stepmother sees her, (she) says to her daughter: “The eyes of that one are like that Fatik from our house.”
- 0039 *Dibê: “De însan li hevdu narin?” Ji xwe ra ew û diya xwe dilîzin û vana jî dilîzin. Lawê Paşê* (Eyşik) says: “But can’t two people resemble each other?” She and her mother dance among themselves, and they (reference is unclear) dance. The Pasha’s son (anticipates the later narrative)
- 0040 *şimika nigê Fatikê dikeve.* The slipper on Fatik’s foot falls (off).
- 0041 *Dikeve, (...) şimikê nigê gava dikeve wê çaxê şimikê dibin, davêjin nizanim dibin davêjin li kuvî? erê! dibin davêjin kanîyê.* (They) bring the slipper (and) throw (it) into at that moment they take the slipper and throw (it) — I don’t know where they take it and throw it? — Yes (of course), they take (it) and throw it in the well.
- 0042 *Dibin davêje kurnê kanîyê, şimika wê, ewê êtîm,* They take it and throw it into the well. the slipper of hers, the orphans
- 0043 *va lawê paşê tere hespê xwe, gava xulam dibin... Dibên: “Paşa em dikin-nakin hesp vediciniqin, avê naxwin.”* This Pasha’s son goes to his horses, when (unclear here) the servants bring (them to the well). (They) say: “Pasha, whatever we try, the horses shy back, they don’t drink the water.”
- 0044 *Dibê: “Bavo îja avê naxwin.” Axirî dibê: “Bigrin kanîyê gi temîz bikin.”* (The Pasha’s son) says: “Father! (apparently addressed to the Pasha himself), (the horses) don’t drink the water now!” Finally (the Pasha says): “Just clean the whole of the well!”
- 0045 *Vana temîz dikin, wê şimika qîzka êtîm, ya Fatikê dibînin.* They clean it, (and they) see that slipper of the orphan girl, of Fatik.
- 0046 *Paşa jî dibê: “Wûn ê bikevin nava vê êlê da bigerin.* The Pasha says: “You will go down among those people and search.
- 0047 *Ava şimika li nigê kê hatî wûn ê ji mi ra bixazin.”* That slipper — whomsoever’s foot it fits you will ask (her hand in marriage) for me.”
- 0048 *Vana dikin nigê kê li niga nayê, tînin dikin nigê Fatikê, nigê Fatikê, şimika wê bûye.* Whomsoever’s foot they put it on, it doesn’t fit, (they) put (it) on Fatik’s foot, Fatik’s foot, (and) it was her slipper.
- 0049 *Tînin Fatikê dixemilînin û dikin paš perdê û (...).* (They) adorn Fatik, put her behind a curtain and (...).
- 0050 *Ê li niga hatî, de lawê paşê dibê: “Ez ê ji xwe ra bînim werim.”* The one whose feet (it) fits, (about her) the Pasha’s son says: “I will take (her) home for myself.”

2.2 Utterances 0051–0100

- 0051 *Damarya wê tê dikute, dikute. Û Eyşika reş, yekî reş e, lêv deqandî bûye.* Her stepmother comes (and) thrashes (her) repeatedly. And the black Eyşik, she is a black one, thin lipped (lêv deqandî is an idiomatic expression).
- 0052 *Tîne wê dike paš perdê û dibê: “Niha dewetê tî û kî çî zane?”* (The stepmother) takes her (Eyşik), puts her behind the curtains and says: “The wedding procession is coming, and who’s to know anything (about it)?”
- 0053 *Fatikê jî digre, dike tendûrê, salkî jorda dide* (She) takes Fatik, puts her in the tendûr, puts a

- ser devê tendûrê.*
- 0054 *Teref xaliqê alemê da hestîyê çêleka wê tê ziman.* flat stone down over the opening of the tendûr. The bones of her cow gain the gift of speech thanks to the Creator of the World.
- 0055 *Gava berbû, dewet tê,* When the berbû(k) (woman sent to fetch a bride (bûk) in a traditional wedding) and the wedding procession arrives,
- 0056 *dîk tê ser şêmûgê, dibê: “Qaqlaqî!” Dibê: “Eyşika rindik tendûrçî Fatma (...).”* the cockerel comes to threshold, saying (=crowing) “qaqlaqî!”. (The cockerel continues:) “Eyşika the fair, Fatma a tendûrçî (‘one who makes tendûr.’)! (check interpretations)
- 0057 *(...) Eyşka keçel paş perdê da.” Li dîk dixin (...)* Cardin *dîk tê, dibê: “Qaqlaqî!”* Bald-headed Eyşik (is) behind the curtain.” (They) beat the cockerel. Once again the cockerel comes, saying: “Qaqlaqî!”
- 0058 *Fatma rindik tendûrçî. Eyşika keçel paş perdê da.”* Fatma the fair (is) a tendûrçî.” Bald-headed Eyşik (is) behind the curtain.”
- 0059 *Wer dibê. Vana dibên: “Helbet di vî dîkî da tişteke heye.”* Thus speaks (the cockerel). They say: “There is certainly something in that cockerel!”
- 0060 *Çer salê tendûrê bilind dîkin, mezê dîkin cc tirînca qîzkê dayî tendûrê. Qîzik bedew e.* Upon raising the stone slab from the tendûr, (they) see that the shining light of the girl fills (lit. has given) the tendûr, qîzik bedew, the girl (is) beautiful.
- 0061 *Terin perdê jî bilind dîkin yeka reş ê pîs heram, fena mirtiva wayê di paş perdê da.* (They) go and raise the curtain (there is) a girl, black and dirty, forbidden, like a gypsy who is behind the curtain.
- 0062 *Destê wê digrin dibên: “Çima aha kirî?”. Dibê: “Welle damarya mi ez aha kirime.”* (They) take her hand, saying: “Why did (she) act this way?”. (Fatik) says: “Well my stepmother put me here like this.
- 0063 *Dibê: “Gava kî we hatî ez xwestime,* (She) says: “When you came and asked for my hand in marriage, (and? — the connection to the preceding is unclear)
- 0064 *paşa şimika nigê mi birîye, dibê: “Qîza xwe anîye, kirîye vira, ez jî êtîm bûme, dîya min tûnebûye.* the Pasha took the slipper of my foot.” (she) says: “(She=the stepmother) brought her own daughter, put her here, as for me, I was (just) an orphan, I had no mother.
- 0065 *Ez avêtime tendûrê.” Dibê: “Dîk hatîye ziman.* (She) threw me into the tendûr.” (she) says: “The cockerel was able to speak.
- 0066 *Ji berbûya, ji xwendîya ra gotîye.”* He told the berbû and xwendî.”
- 0067 *Vana radibin dibên: “Em çer bikin?”. Ji tendûrê derdixînin.* They say “What shall we do?” (They) pull (her) out of the tendûr.
- 0068 *Berbû (...) wê ji pişt perdê derdixînin.* And the berbû pull her out from the back of the curtain.
- 0069 *Eyşikê derdixînin, Fatikê dîkin paş perdê, dixemilînin.* (They) pull out Eyşik, (and they) put Fatik behind the curtain, (they) adorn (her in preparation for the wedding)
- 0070 *Radibin deweta wê digrin, birê dîkin û dewet tere.* (They) go and perform her wedding dance (and then) they accompany (the bride) and the wedding procession leaves (for the groom’s house).
- 0071 *Dewet tere, em bîn dewet pir tere, hindik tere. Vana terin para berdidin keçê.* The wedding procession goes, let’s say: the wedding procession is on its way (lit. ‘goes a lot, goes a little’). They (the stepmother etc.) go and grab the girl from behind.
- 0072 *Keçê çer temkî lêdxînin, ew damarya qîzkê,* On giving the girl a hefty shove, the stepmother

- qîzik jorda tere, dikeve erdê. Ber yanê kanyê da dibe du gula.*
- 0073 *Heşîn dibe (...).*
- 0074 *Zava, merê wê, lawê paşê, wer dilê wî dikeve herdu gula.*
- 0075 *Diçîne û li ber serê xwe ra dike.*
- 0076 *Birêda ewa reşa lêv deqandî dibê: “Bizê mi ji wan gulan tê. Bira ji ber serê xwe bavêje.”*
- 0077 *De dizane.*
- 0078 *Divê: “Bira ji ber serê xwe bavêje.”*
- 0079 *Paşa dibê: “Mi jê hezkirî, çima ez bavêjim?”
Dibê: “Bira bavê.” Va davêje.*
- 0080 *Li pê dibe canûk, bi nava hespa dikeve, tere.*
- 0081 *Tere, cardinê, em bên fena ji vira (...) ji (Village Name) to Kaxê Darê.*
- 0082 *Dewet tê ber kanîyê. Li ber kanîyê dewet peya dibe.*
- 0083 *Dibê: “Ez çer bikim, ez serê vîya wenda kim.”
Dibê: “Bira wê canûyê bikujin.”*
- 0084 *Dibên: “çima?” Dibê: “Bira bikujin, ez ji canûyê diqarim” “Va çima canû nava hespa ketî?”*
- 0085 *Divê filankes: “Canû ye, mi jê hezkirî, di nava hespa da ye, çima bikujin?” Dibê: “Na bira bikujin.”*
- 0086 *Cardin teref xaliqê alemê da ew canûya dibe heywanik.*
- 0087 *Nizanim dibe çêlek, nizanim dibe golik, nizanim dibe nogin. Diha derew Xwedê nenivîsîne,*
- 0088 *tere li kêleka derê malê rc nêzikîya ew peya dibe,*
- 0089 *ew li kêleka derê malê da dibe darek, hêşîn tê. Darek bedew, hêşîn tê.*
- of the girl, the girl falls down (off her horse), falls to the ground. At the side of the well, she turns into two rose-bushes.
(They) grow and blossom (lit. ‘become green’).
The bridegroom, her man, the Pasha’s son, his heart is so taken by the two roses.
(He) plucks (them) and puts them on his head(wear).
On the way, the black one with thin lips (Eyşik) says: “Those roses irritate me (lit. ‘my anger comes from’). (He) should cast (them) from his head.”
Of course (she) knows (that the flowers are really the girl).
(She) says (to the Pasha): “Cast them from your head!”
The Pasha says: “(If) I like it, why should I throw (them off)?” (She) says: “Throw (them away)!” He throws (them away).
From that becomes a foal (out of the flowers), joins the horses (of the procession), and goes (along with them).
It (the procession) goes on again, let’s say like (i.e. as far as) from Village Name to the Fields of Trees (refers to a plot of land close to the village, characterised by trees, and familiar to the listeners).
The wedding procession reaches the well. At the well, the (riders of the) wedding procession dismount.
(Eyşik) says: “What should I do, (in order) to get rid of her (Fatik).” (She) says: “They should kill this foal.”
(They) say: “Why?” She says: “just kill (it), I hate that foal.” “Why is this foal among the horses?”
(someone) says: “It’s a foal, I liked it, it’s among the horses, why should (they) kill (it)?” (She) says: “No, they should kill (it).”
Once again with the help of the Creator of the World that foal becomes a (different) animal.
I don’t know (if) it becomes a cow, I don’t know (if it) becomes a calf, I don’t know (if it) becomes a heifer. May God never utter (lit. ‘write’) a lie, (it) goes to the vicinity of the door of the house, near the place where (one) dismounts (from a horse; this is grammatically difficult to justify, but according to the consultant, the correct interpretation),
near the door it (the animal) becomes a tree, and grows to maturity. A beautiful tree, it grows to maturity.

- 0090 *Dibê: “Em çer bikin, çer nekin.”* (She) says: “What should we do, what shouldn’t we do?” (Expression of desperation, relevance unclear)
- 0091 *Hemle dimîne, Xwedê ewa reş (pause) zara didê.* (She) becomes pregnant, God gives the black one children.
- 0092 *Gava doxim dike, dibê: “Bira vê dara kêleka mala me, wan textê wê gi bibire.”* When she gives birth, (she) says (the identity of the addressee remains uncertain): “That tree near our house, cut it all up into planks (lit. ‘cut all its planks’).”
- 0093 *Dibê: “Ji lawî mi ra têkin bêşik.”* (She) says: “Let (someone) make (them into) a cradle for my son.”
- 0094 *Cardin paşa tîne wê darê dibire, ji lawî wê ra dike bêşik. Ew bêşika gi dibe derzî, di wê dergûşa wê ra tere.* So then the Pasha cuts down that tree, makes it into a cradle for her son. That cradle becomes all (full of) needles, (which) penetrate that baby of hers.
- 0095 *Dike-nake dergûşa wê ranakeve. Hema wê bêşikê tîne hûr dike, davêje tendûrê.* Do what she will, her baby cannot sleep. (She) takes that cradle and destroys it, throws (it) in the tendûr.
- 0096 *Davêje tendûrê, (...) berdestîya wan hebûye, tere xwelîya derdixîne.* throws it in the oven, (...) they had a female servant, (she) goes (and) takes out the ashes (from the tendûr).
- 0097 *Mêze dike nîkek wer bedew, nîka teşîya.* (She) sees a needle (or hook?), so beautiful, it is the needle of a spindle.
- 0098 *Fena zêr rind e, (di)teyise, derdixîne hema digre davêje pencerê.* (It) is fine like gold, (it) shines, (she) pulls it out (of the ashes) and immediately throws it out the window.
- 0099 *Diavê pencerê. Hezkirina xalqê alemê di pencerê da dibe dîsa fena xwe a berê.* (She) throws it (out) the window. (Through the) love of the (creator) of the people of the world (it) becomes in the window like it was before.
- 0100 *Tê di nav mala pašê da digere, şixula dike, xwe vedişêre.* (She, i.e. the girl transformed from the spindle) comes, wanders around in the house of the Pasha, does chores (and) hides herself.

2.3 Utterances 0101–0148

- 0101 *Rokî, dudu, sisê, Paşa dibê: “Ez gava têm hundirê malê, van rana mala me wer tewkî ye.* One day, two days, three days (pass), the Pasha says: “When I come inside these days our house is somehow strange.
- 0102 *Diha xweş e, diha rind e.” Dibê: “Ez li tiştê ketime şikê, diha nizanîm çî ye.”* It is more agreeable, more beautiful.” (He) says: “I suspect something, (but) I don’t yet know what it is.”
- 0103 *Dibê: “çî ye?”, dibê: “Welleh ez carik duduya hatim qîzek di nav mala me de digere, ez gava tîmê tune, qayb dibe.”* (She) says: “What is it?” (He) says: “By God, once or twice I come (home) and a girl is running around in our house, when I come to her, she disappears.”
- 0104 *Paşa rokî qîzê gund giştê telîf dike tîne dibê: “Bira em îro zibaretî daynin.”* One day the Pasha invites all the girls of the village, saying: “Let us today undertake our communal work (zibaretî, cf. Chyet 2003).”
- 0105 *Zibarê xwe datîne. Hirîyê şeh dîkin.* (They) set about doing their communal work. (They) card the wool.
- 0106 *Paşa dibê: “Mêze ez vamê, ji we ra dibêm,” dibê “gava ez çîrokî mi heyê ez dibêmê”, dibê:* The Pasha says: “Look, here I am, I tell you, I have a story, when I tell (it) to you, neither he

- “ne yê der tê hundur, ne ji hundur tere derva.” (who is) outside comes in, nor (he who is) inside goes out (till the story is finished).”
- 0107 *Va çîroka xwe tamam dibê, tamam dike, qîzika te ji pencerê der tê.* He tells his story completely, (just as he) finishes (it), your girl comes in through the window.
- 0108 *Qîzik ji pencerê der tê. Qîz e, fena xwe berê ye.* The girl comes out of the window. It’s the girl, (she) is like she was before.
- 0109 *Mi çer ji we ra gotî, ew wer ji paşê ra wê çîroka xwe gişkî qise dike,* (Just) as I told you, she tells the Pasha all this tale of hers,
- 0110 *gi dibê: “Aha kir, li mi aha kir, ez aha ketim paş perde, birêda li mi aha kir.* (she) tells everything: “(She) acted like this, I did such-and-such, I got behind the the curtain this way, on the way (she) did this to me.
- 0111 *Heta ez bûm du gula te li mi aha kir.” Giş ji serî da mi çer ji we ra gotîye, wer dibê.* Until I became two roses, (and) you did such-and-such to me.” Everything, from the beginning on, just as I told you, she recounts.
- 0112 *Dibê: “Lê îja em çer bikin, em serê wê wenda bikin.”* (She) says: “What should we do then, (in order) to be rid of her?” (presumably refers to the step-mother)
- 0113 *Dibê “Hespê mi hene, canûyê mi gelek in.”* (He) says: “I have horses, I have many foals.”
Dibê ‘Ez ê hespa bela bikim, (He) says: “I will disperse the horses
- 0114 *canûkî minê pîr nerind ji heye, ez ê bidim cem te.”* and I have a very ugly foal, I will bring it to you.”
- 0115 *Dibê (...): “Tu ê ji canûyan kîjan nerind e, bide min.”* (She) says: “Whichever foal is ugly, give it to me.”
Dibê: “Wê canûya te ez xwedî dikim, ji hespê te kîjan rind e jî tu bela ke.” (...) (She says): “I will raise that foal of yours, and whichever of your horses is beautiful, you will drive it away.”
- 0116 *Dibê: “Eger em serê wê aha wenda kin.”* (They) say: “Maybe only in this manner we can be rid of her.”
- 0117 *Diha van hespê xwe bela dike, dibe bihar, dibê: “Ez ê hespa tov kim.” (...)* (So he) disperses his horses, spring comes, (then he) says: “I will gather the horses.”
- 0118 *Tere, hinik hişk bûne hinik sax in, hinik ne rind in* (He) goes (to get the horses), some have died, some are healthy, some are in poor condition.
- 0119 *Dibê: “Welleh canûkî me, me daye qîzika feqîrî, di mala pîrê da ye.”* (He) says: “Well a foal of ours, we gave to a poor girl, (she) is in the house of the old lady.” (from this point on the story becomes somewhat disjointed; the narrator appears to have skipped some intermediate parts.)
- 0120 *Dibê “Ez ê herim ji wê canûya xwe bînim, bixazim, hela heye, tune.”* (He) says: “I will go now and fetch my foal from her, ask (for it back), (I wonder) if it’s there or not.”
- 0121 *Tere, pîrê dibê: “Hetanî xwedîyê hespê neyê, dibê, hesp ji hundir dernayê.”* (He) goes, the old lady says: “As long as the owner of the horse doesn’t come,” she says, “the foal won’t go out.”
- 0122 *Dibê: “Erê, erê canûkî pîs î heram daye, îja hesp ji hundir dernayê.”* (She) says: “yes, yes (he) gave (me) this dirty and disgusting (lit. ‘forbidden according to Islam’) foal, now the horse won’t come out.”
- 0123 *Dibê: “Wellahî heta paşa bi xwe neyê, de duwar neqelişîne, ez ji hundir dernayêm.”* (She) continues: “By God, so long as the Pasha himself doesn’t come (and) breaks the wall, I won’t come out.”
- 0124 *Tere mêzedike, hespek terikî,* (He) goes, looks (and sees) a huge horse,
- 0125 *serê wî çûye ber arîka. Bi xwe xwedî kirîye. Qîzkê ser çavê xwe di ber da şuştîye.* it’s head reaches up to the ceiling of the stall. (the girl — the interpretation is unclear) herself had raised (the horse). The girl had washed her-

- 0126 *Gi bûye ceh û ûnce. Wer xwedî kirîye, hesp buye fena sûret.* self in front (interpretation unclear). It was all (full of) barley and ûnce (?). (She) had raised (it) in such a manner (that) the horse had become like a picture.
- 0127 *Hespê xwe ji hundir derdixîne.* (She) takes the horse from inside.
- 0128 *Hesp hinkî tere meydanê. Dibeze, virda tê, wêda tê.* The horse goes a short way towards the square. (It) gallops, comes hither and thither.
- 0129 *Hesp xwe davê erdê, ev hespî temî dike qîzik.* The horse throws itself on the ground — she gives the horse instructions, the girl.
- 0130 *Dibê: “Tu gava çû-hat, tu xwe bavê erdê, kî tê tu ranebe haya ez têt=ê.”* (She) says: “When you have gone hither and thither, throw yourself to the ground, whoever comes, you should not get up until I come.”
- 0131 *Gava qîzik tere hinkî serê meydanê, binê meydanê ewa reş ditirse, damarî ditirse. (...)* When the girl goes a little to one end and the other of the square, the black one is frightened, the stepmother is afraid.
- 0132 *Hesp xwe diavê erdê.* The horse throws itself to the ground.
- 0133 *Dike nake kî tê nigê xwe tê hildide, hesp ranabe. Paşa pir berê hespê dikeve.* Do what they want, whoever comes and kicks the horse, the horse doesn't get up. The Pasha was very upset about the horse.
- 0134 *Dibê: “Aqasa rind xwedî bûye, ez qa vî hespî xwe berdidim.”* (He) says: “(It) was raised so well, I really cannot let this horse of mine go.”
- 0135 *Dibê: “Gazî xwedîyê wî kin, bira xwedîyê wî wer=ê.”* (He) says: “Call its owner, its owner should come here.”
- 0136 *Dibê kî ma, kî nema, dibê qîza pîrê ma.* Who stayed, who did not, the old lady's daughter stayed. (interpretation unclear)
- 0137 *Pîrê dibê: “Heta ji derê mala mi da xalîça ranexînin, qîza min nayê.”* The old lady says: “As long as they have not laid carpets from the door of my house, my daughter won't come.”
- 0138 *Terin, tînin. Xalîça li ber nigê qîzkê radixin.* (They) go (and) get (carpets). (They) lay the carpets under the girl's feet.
- 0139 *Qîzik tere ber hespê, nigê xwe aha li hespê dixê. Dibê: “De! hesp ji xwedîyê xwe bêbextiro.”* The girl goes up to the horse, and strikes (it) like this with her foot. (She) says: “De! (sound uttered to get animals to move) horse, who is more unfortunate than its owner!”
- 0140 *Gava wer dibê paşa anamiş dike.* When she speaks thus, the Pasha understands.
- 0141 *Anamiş dike, Paşa tere dibê: “Pîrê” dibê, “ez xwezgîniyê qîza te me, ez qîza te dixazim.”* (He) understands, the Pasha goes and says: Old lady, I am the suitor of your daughter, I ask for your daughter's hand in marriage.”
- 0142 *Dibê: “Lê ewa ereba reş li mala te da. Ez karim qîza xwe bidim.* (The old lady) says: “But what about that old black Arab woman in your house? (If you deal with her) I can give (you) my daughter's hand in marriage.”
- 0143 *Dibê: “Ez serê wê wenda dikim.” Dibê: “Tu çer wenda dikî?” Dibê: “ez wenda dikim.”* (He) says: “I will get rid of her.” (She) says: “How will you get rid (of her)?” (He) says: “I'll get rid (of her).”
- 0144 *Tere, tîne qantirkî tî dike, yekî birçî dike.* (He) goes, brings a mule and lets it go thirsty, and lets another one go hungry.
- 0145 *Ya tî avê dide ber, lê, giyê dide ber ya birçî ji avê dide ber.* The thirsty one (he) puts water in front of, no (the speaker corrects herself) grass in front of (it), the the hungry one he puts water in front of.
- 0146 *Xwe kaşdikin, ewê dixeniqînin, dikujin.* (They) pull (against each other — presumably

- 0147 *Welleh paša teze heft ro, heft ševa deweta xwe û wê dike. Ew bi miradê xwe ša dibin, tu jî bi mirade xwe ša bî.* they are tied together), they strangle her and kill her (i.e. the stepmother's daughter, who, we must presume, has somehow become entangled in the ropes tied to the two mules.)
- 0148 *Çîroka mi çû dîyara rehme li dê û bavê gudara.* By God the Pasha now celebrates his own and her wedding seven days and nights. (They are very content with their lot, may you too be happy with your lot.)
- 0148 *Çîroka mi çû dîyara rehme li dê û bavê gudara.* My story has come to an end, may Allah's mercy be on the mothers and fathers of the listeners.

Multi-CAST

Multilingual Corpus of Annotated Spoken Texts



multicast.aspra.uni-bamberg.de/

